Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1308 | 17-Îlon-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê 2 cihên şûnwariyê...(7)

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

**Li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi dehan cihên dîrokî ku dîroka wan vedigere hezarên salan, hene. Her cihek xwedî şarestanî, nirx, çand û dîrokeke. Ji van cihên şûnwariyê; Qesr Elbenat û Sûra Reqayê.**

Qesr Elbenat an jî Koşka Keçan herwiha bi navê Koşka Ebasiyan jî tê nasîn, li ser bermahiyên bajarokê Rafîqa ya ku niha beşekî bajarê Reqayê hat avakirin ku li ser beşa bilind a Çemê Feratê ye. Piştî çaksazkirina tevahiya beşên wê, ji nû ve hûrgiliyên wê bi hûrbînî diyar bûn. Koşka Elbenat yek ji Koşkên Ebasî yên ku avakirina wan vedigere serdemên destpêkê yên ebasiyan e û li aliyê başûr-rojhilatê Reqayê dikeve.

**Sûra Reqayê**

Dîroka vê sûrê vedigere serdema Ebasî ya yekem (nîvê sedsala duyem a koçî / heştemîn a zayînê). Ji kelpîçan û cepsînê hatiye avakirin. Dirêjahiya wê digihêje nêzî 5 km'yan e. Dirêjahiya wê ya niha 3 kîlomitre û nîv e, pehnahiya wê 6 metreyan e û ji aliyê jorîn ve nêzî 5.90 metreyî ye, lê tevî cudahiya di bilindahiya wê ve, bilindahiya wê bi giştî ji 9 heta 13 metreyan e. Herwiha gelek caran hatiye çaksazkirin a herî dawî jî di sala 2010'an de bû ku tê de dîwarên ku ji kelpîçan hatibûn çêkirin hatin vekirin û kelpîçên ji ber şiliyê xerab bibûn, bi kelpîçine nû hatin guhertin û bingehên wê hatin xurtkirin. Di heman demê de naverûyê wê ji kelpîçên pijiyayî hatibû çêkirin û bi heman pîvanên yên kevin yên Ebasî ku 7 bi 15 cm(santî metreyan) bi 27 cm santî metreyan bû.




## FERHENGA BIWÊJAN

**Pembû xist guhê xwe:**
- Xwe nebihîstî kir; xwe kerr kir; çawa ku nebihîstibe; guh nedayê.

**Reşê xwe kişand serê xwe:**
- Xwe bêdeng kir; tevlî nebû.

**Serê min jê naêşe:**
- Eleqeya min pê nîne; min eleqedar nake; ne karê min e; têkiliya min pê re nîne.

**Xwe da kerrê:**
- Dengê xwe nekir; xwe nebihîstî kir; çawa ku ne jê re hatibe gotin; çawa ku nebihîstibe.

**Xwe kerr kir:**
-Bi heman wateyê.

**Xwe vekêşa ser hev:**
- Têkiliya xwe ji tiştekî neanî; tevlî tiştekî nebû; destê xwe ji her tiştî kişand; li mala xwe rûnişt.

**Xwe kişand qalikê xwe:**
- Bi heman wateyê.

**LI SER KESÊ TEVLÎ HER KARÎ DIBE**

**Destê xwe dixe nava her tiştî:**
- Bi heman wateyê.

**Dibe danê her girarê:**
- Xwe tevlî her karî dike; li her cihî xuya dike.

**Dibe xwêya her girarê:**
- Bi heman wateyê.

**Di sîtila her kesî de dikele:**
- Bi heman wateyê.

**Dikeve navbera ker û kurtên:**
- Pozê xwe dixe her qulê; xwe tevlî her tiştî dike.

**Kî aş e ew qeraş e:**
- Xwe di ber her tiştî re dike; tiliya xwe dixe nava her tiştî; karê wî be ne karê wî be, xwe dixe nava her tiştî; her tiştî dixwaze.

**Kî bûk e ew berbûk e:**
- Bi heman wateyê.

**Kî xal e ew jî heval e:**
- Bi  heman wateyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

# Gundê Eyn Dîwer (Kaniya Dêwa)

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

**Gundê Eyn Dîwerê yek ji gundên kevnar yên Rojavayê Kurdistanê ye û xwedî cihekî pir girîng e, ew dikeve navbera Bakur, Başûr û Rojavayê Kurdistanê de. Ev gund bi kaniyên xwe û pira Bafidê navdar e.**

**Taybetmendiyên gundê Eyn Dîwerê**

Eyn Dîwer yek ji gundên kevnar yên Rojavayê Kurdistanê ye, dikeve navbera Bakur, Başûr û Rojavayê Kurdistanê de. Ev gund bi ava û ganiyên xwe tê nasîn, tê de 12 kanî hene. Di heman demê de kevintirîn pir jî têde heye ku beriya sedê salan hatiye avakirin, navê Pira Bafid lê tê kirin.

Navê wê bi kurdî Kaniya Dêwa ye, lê bi zimanî erebî jê re dibêjin Eyn Dîwer. Destpêkê ev gund nêzî 30 malî têde hebû, lê bi demê re de bû paytexta herêma Cizîrê. Dema Ferensî derbasî herêmê bûn navenda xwe ya leşker li gundê Eyn Dîwerê ava kirin. Dema di gund de bicih bûn gund pêş xistin û şaredarî têde ava kirin, di heman demê de navendeke tenduristiyê, şanogeh, nivîsgeh û dibistan jî ava kirin. Ji ber ku cihekî istratîjîk bû Feransiyan gelek guhdan dida yê. Gundê Eyn Dîwerê ava bû hîn bajarê Dêrikê ava ne bibû. Lê ji ber sedema nakokî û ne aramiya di nav bera Ferensa û dewleta Tirk de hebû êdî Feransiyan berê xwe dan bajarê Dêrikê û di sala 1929'an de Qijle ava kirin û guh dan bajarê Dêrikê û pêş xistin û Eyn Dîwer paş guh kirin.



Sala 1930'î dema navenda tenduristiyê ma vala bijîşkê bi navê Nafiz Zaza birayê Nûredîn Zaza ji Şamê hat û ew navend bi rêve bir û guhert, ev navend xist nexweşxane û Rêveberê Şaredariyê Ebdulkerîm Mele Sadiq bû van her du kesan gund pêşxist û bû bajar hijmara kesên ku lê dijiyan gihişt 10 hezarî, bêtirî xwe xiristiyaniyan cihê xwe têde digirtin dema Feransî çûn wan jî jê barkirin. Lê dema niha de nêzî hezar û 500 kes di gund de dijîn.

**Eyn Dîwer gundekî istratîjîk e**

Eşîrên ku cihê xwe di gund de digrin Harûna, Şikaka, Torî, Batûyî, Hesina û Elîka. Nêzî 7 gundan girêdayî gundê Eyn Dîwerê ne, hemû xirabûne Eyn Dîwer tenê maye, ji ber ku berî 500 salî cihê Eyn Dîwerê li jêr bû û ev gund jî li derdora wê bûn ji ber pêlên avê xurt bûn ew gund hemû xirabûn, êdî Eyn Dîwer hat jor û heya niha li cihê xwe ye. Di heman demê de 12 kanî jî li gund hene wek kaniya Dêwa, Şikeftê, kole, Xeyda, Kezîkur, Rûlik, Beraz, Kîso, Emerê Sexî, korik, girkê Mişka û kewa. Ji ber ku ev gund bi av û kaniyên xwe zengîne bû, gundiyan hemû cûreyên çandiniyê dikirin. Her wiha di dema berê de gundiyan zeviyên meletê Cizîra Botan diçandin û dawiya demsala çandiniyê dihatin para xwe ji gundê Eyn Dîwerê dibirin. Lê di van salên dawî de sedema nakokiyan di navber gelê kurd û dewleta Tirk de, êdî dewleta Tirk ava Dicle digre û hemû kaniyên di gund de çikane, niha jî gundî rastî pirsgirêka nebûna avê di malên wan de, dijîn. Ji ber ku ev gundekî çîwaze bi hestên xwe yên netewî û tevgera xwe ya siyasî dagirkeriya Tirk dijminatiya vî gundî dike û her dem bi topan êrişî gund dike û ne aramiyê di nav gundiyan de belav dike.

Bi kamîreya Ayşa Silêman



# Li Rojava yekemîn dezgehên ragihandinê yên nivîskî

Şoreşa ku bûye deng û vîna gelan, beriya 14 salan ji bo jiyana azad û demokrasiyê dest pê kir. Rojnameya Ronahî û Ajansa ANHA'yê yekemîn şahidên ku ev têkoşîn û berxwedanî gihandine cîhanê û bûne dengê rastiyê. **R-3**

# 'Pêwîst e her kes xwedî li avakirina civakeke azad û demokratîk derkeve'

Endama Meclisa Partiya Yekîtiya Demokrat PYD'ê Sureya Mustefa diyar ku pêwîst e her kes Manîfestoya Aştî û Civaka Demokratîk bixwîne da ku xwedî li siberoj û avakirina jiyaneke azad, aştî û demokratîk derkeve.**R-5**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1308 | 17-Îlon-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# JIN JIYAN AZADÎ VEJÎNA DÎROKÊ

Serhildana Jin, Jiyan, Azadî ku li Rojhilatê Kurdistan û Îranê li hemberî polîtîkayên rêjîmê hatibû destpêkirin, 3 sal li pey xwe hişt. Felsefeya 'Jin, Jiyan, Azadî' ku bingeha wê ji Kurdistanê derketiye, di têkoşîna azadiyê ya jinan de bûye dirûşmeyeke gerdûnî û ji nû ve dîroka têkoşîna jina serhildêr nivîsandiye.**R-2**





## 'Pêwîst e hikumeta veguhêz gavên berbiçav bavêje'



Hevseroka Partiya Têkoşîna Demokratîk Xunav Mele diyar kir ku danûstandinên Rêveberiya Xweser bi hikumeta veguhêz a Sûriyê re di çend qonaxan re derbas bûne û got, "Astengiyên pêkanîna pratîk û lihevkirina li ser mekanîzmeyên destûrî ji aliyê hikumetê ve derdikevin."**R-4**

## Hîmên wêjeyê



Çîroka her tiştî heye û çîrok dibe bingeha helbest, destan û hwd. Mirov dikare bibêje ku çîrok dayika wêjeyê ye. **R-7**


Bi şivên re digere û gur re dixwe!
Dilyar Cizîrî R-4


Tirsa şerê Îsraîlê
Farûk Sakik R-5


Hevgirtina civakî û avakirina pêşerojê
Rohat Bulut R-6

# 'Em ê çandiniya avî çalak bikin'

Hevserokê Komîteya Çandiniyê ya kantona Cizîrê Sozdar Biro diyar kir ku ew hewldanên pir mezin dikin ji bo peydakirina pêdiviyên cotkaran û wiha got: "Di sala nû ya çandiniyê de wê mazot li ser 6-7 caran li cotkaran were belavkirin û em ê çandiniya avî aktîv bikin."**R-6**



# Serhildana Serdemî a Jin, Jiyan, Azadî teqîna dengê serhildêr û azadîxwazan bû

Serhildana Jin, Jiyan, Azadî ya li Rojhilatê Kurdistan û Îranê ya li hemberî polîtîkayên dewletê 3 sal li pey xwe hişt. Felsefeya 'Jin, Jiyan, Azadî' ku bingeha wê ji Kurdistanê derketiye, di têkoşîna azadiyê ya jinan de bûye dirûşmeyeke gerdûnî.

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

Serhildana Jin, Jiyan, Azadî ya li Îran û Rojhilatê Kurdistanê a li hemberî pergala baviksalar a sermayedar a Îranê dikeve sala xwe ya çaremîn. Serhildana Jin, Jiyan, Azadî 16'ê Îlona 2022'yan piştî qetilkirina jina ciwan a Kurd Jîna Emînî (22) ji aliyê 'Polîsên Exlaq' ve, dest pê kir. Jîna Emînî 13'ê Îlonê dema diçû serdana xizmên xwe yên li bajarê Seqizê bi hinceta ku porê xwe nenixumandiye ji aliyê 'Polîsên Exlaq' ve hat destgîrkirin û veguhezî navenda destgirtinnê ya li Tehranê hat kirin. Di dema destgirtinê de rastî îşkenceyeke tund tê û piştê 3 rojan ji ser hişê xwe diçe, piştre jiyana xwe ji dest dide.

### Bi Jîna Emînî re dengê tepisandî, teqiya

Yekemîn car e di dîroka Îranî de bûyerek bi vî awayî deng vedide û sîstema Îranî dihejîne. Bûyera qetilkirina Jîna Emînî dibe ku ne yê yekemîn di Îranê de be, lê di Serdema 21'emîn de jinên azadîxwaz, serhildêr, yên ku di bin sîstema miliyetiyê de nefes nastînin; Êdî bi Jîna Emînî re teqiyan û qêrîna yekbûyîna xwe bêyî ku bêjin Kurd e yan Faris e raber kirin. derketina helwesta jinan di Îranê de, tirs xist hundir sîstem û zihniyeta dewleta Îranê. Bi vê yekê re piştî ku Jîna Şehîd ket û jinan serî rakir ku di dîroka Îranê de weke 'Serhildana Jinan' tê hesibandin, rêjîmê dest bi kiryarên xwe kir. Rêjîma Îranê jinên siyasetmedar, rewşenbîr, xwendekarên zanîngehan, rojnamevan û jinên serhildêr, girtin. Di zîndanên faşîzma Îranê de ev jin rastî hemûû cureyên tundiyê hatin, hinek ji wan jî biryarên darvekirinê lê hatin birîn, hinek ji wan heyanî niha jî di zîndanê de ne û nehatine dadgehkirin. Di qadên serhildanê de, jin bi fermi rastî kiryarên dijmirovî û lêdanê dihatin. Ev yek bû sedema dengvedana doza Jîna Emînî bibe sedema qêrîna jinên cîhanê.


Şehadeta Jîna Emînî ji karesateke takekesî zêdetir bûye sembola şiyarbûna civakî û siyasî. Li Îranê daxwazên jinan ên azadiyê û berxwedana li dijî dewletê ne tenê polîtîkayên rejîmê yên li ser jinan, hemû pêkhateyên otorîter hedef digirin. Ev pêvajo bûye sedema bangewaziyek niştimanî û navdewletî ji bo pirsiyarkirina siyasetên zordar ên rejîmê û berdewamiya hêza berxwedanê nîşan dide.

Bi belavbûna nûçeyên têkildarî qetilkirina Jîna Emîn re, gelê bajarê Seqizê xwepêşandan li dijî desthilta Îranê dan destpêkirin. Bi hezaran kesî bi merasîmeke girseyî cenazeyê Jîna yê spart axê. Di merasîma veşartina cenaze de dirûşma 'Jin, Jiyan, Azadî' hat berzkirin. Piştî 137 rojan serhildana ku bi dirûşma 'Jin, Jiyan, Azadî' dest pê kir li gelemperiya Rojhilatê Kurdistanê û Îranê berbelav bû. Serhildêran daxwaza pêkanîna demokrasiyê û hilweşandina rejîmê kir.

Li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê şidet, tundî, darvekirin û qetilkirina jinan rojane ye. Civaka Îranî ku jinê zêdetirî kole û bindest nabîne, maf jiyana jinan sîdordar dibînin. Ji beriya serhildana 'Jin Jiyan Azadî' a 16'ê Îlona 2022'an de kuştin, îşkence, destdirêjî, revandin, talankirin û darvekirin li ser jinan rojeva jiyana hemû jinan bû, lê piştî qetilkirina Jîna Emînî yê ku ji ber tayek ji pore wê ji bin desmalê derket hat qetilkirin, piştî îşkencekirina Jîna Emînî û kuştina wê guhertinek di Îranê derket serhildan dan despê kirin. Serhildana Jin Jiyan Azadî li Îranê û tevahî cîhanê dengvedaneke dîrokî çêkir, neqebûlkirin û redkirina wê tundiyê ji aliyê jinan ve li Îranê derket pêş, hemû jin derketin kolanan û çalakî ji bo neqebûlkirina vê tundiyê li darxistin, lê rêjîma Îranê ji ber zihniyrta xwe ya tund û paşverû li pêşiya wan sekinî û bi kîmyayan êrîşî wan jinan kirin lê ji ber hêrsa wan a întîqamê berxwedaniya xwe berdewan dikin.

### Dûrişmeya Jin Jiyan Azadî mohra xwe li dîroka Îranê xist

Qetilkirina Jîna Emînî bû çirûska serhildaneke gerdûnî ya jinan. Dengvedana dirûşma Serhildana Jin, Jiyan, Azadî ku Rêber Apo di dawiya salên 80'yî de pêşkêş kiribû, li her deverê deng vedide. Serhildana li Îran û Rojhilatê Kurdistanê qonaxeke bibandor di dîroka Îranê de çêkiriye. Yekem car di dîroka Îranê de tevahî beşên civakê bi yek dirûşmê li dora hev kom bûn û daxwaza guhertina feraseta dewleta serdest a li hemberî jinan kir. Ji bo piştgirî û xwedîderketina li serhildanê jî li tevahî cîhanê çalakî hatin lidarxistin. Jinan di çarçoveya serhildana li hemberî pergala dewletê de çalakiyên wekî birîna por, grevên giştî, girtina dikanan û nivîsandina dirûşman li ser dîwaran li dar xistin. Li dibistan û zanîngehan jî çalakî hatin lidarxistin û îmze hatin komkirin. Rejîma Îranê bi armanca bidawîanîna li serhildanê, hemû cûreyên zext û tundî wekî êrişa bi çek û daran, bikaranîna gazan, jehîrkirina xwendekaran xistin dorê. Di heman demê de êriş bire ser mal û cihên kar ên xwepêşandêran, ew destgîr kirin, îşkence lê kirin û bi dar ve kirin.




### Bîlançoyek zelal nine

Desthilata Îranê bîlançoya kesên di xwepêşandanan de hatin girtin, qetilkirin û bidarvekirin, vedişêre. Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî di raporekê de diyar kir ku darvekirinên sala 2023'yan de çêbûne, ji sedî 47 angu ji yên sala 2015'an ve zêdetir in. Li gorî pisporên Neteweyên Yekbûyî (NY) desthilata Îranê ji destpêka (2024) ve zêdetirî 400 kes bi dar ve kirine ku di nava de 15 jin hene. Dewleta Îranê ji bo pêşî li pêla serhildanê bigire înternet li ser herêmê qut kir. Rojnamegerên qetilkirina Jîna Emînî ragihandibû Nîlufer Hemîdî û Îlahe Mûhammedî û gelek rojnamevan destgîr kirin. Her wiha lîstikvan Terana Elîdostî, Taha Resûlyan û Mihemed Sadiqî yên ku piştgirî dan serhildanê jî hatin destgîrkirin. Li gorî malpera Iran International, dewleta Îranê 31'ê Tebaxa îsal pêleke din a êrişên destîgirkirinê li Rojhilatê dabû destpêkirin, li bajarên Mehabad, Pîranşar, Aşnoye û Dehklanê bi kêmanî 20 kes destgîr kirin.

### Hêz û berxwedaniya jinan her ku diçe mezintir dibe

Tevî hemû zor, zext, tundî, îşkence û darvekirin, serhildana jinên Rojhilatê Kurdistanê û Îranê ya li hemberî pêkanîn dewletê her ku diçe mezintir dibe. Di Tîrmehê de 26'emîn şaxa Dadgeha Şoreşê ya Tahranê bi hinceta "îsyana çekdarî li dijî dewletê kirine" cezayê darvekirinê li rojnamevan Pexşan Ezîzî û çalakvana mafên jinan Şerîfe Mihemedî hate birîn. Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî ragihand ku di dema ragirtinê de mualemeya xirab û îşkence li Pexşan Ezîzî û Şerîfe Mihemedî hatiye kirin. Rêxistina Mucahidî Xelq a Îranê di raporekê de ku 11'ê Îlona îsal weşandiye diyar kir ku hêzên ewlehiyê yê hêzên pasedarên Îranê di serhildanê de bi kêmanî 700 kes qetil kirine. Rêxistinê îşaret pê kir ku nasnemyên 580 kesên hatine qetilkirin hatine zanîn. Li gorî rêxistinê di serhildanê de 30 hezar jin û mêr ên kêmî 25 salî ji aliyê desthilata Îranê ve jî hatine destgîrkirin, zext û îşkence li wan têne kirin da ku wan neçar bikin ku îtîrafê bikin.

### Li Hindistanê 'JIN, JIYAN, AZADÎ'

Dirûşma 'Jin, Jiyan, Azadî' ku di tevahî serhildanên jinan de tê berzkirin, li dijî hemû rêbazên zilm û zordestiyê bûye sembola yekbûyîna jinan a li hemberî zilm û zordestiyê. Herî dawî li bajarê Kalkuta yê girêdayî eyaleta Bengala Rojava ya Hindistanê 9'ê Tebaxê tecawiz li bijîşkekê hat kirin û paşê hat qetilkirin. Piştî bûyer hat bihîstin, li gelek deverên Hindistanê bijîşk û jin bi dirûşma 'Jin, Jiyan, Azadî' derketin kolanan û hêrsa xwe anîn ziman.

### Bê helwestiya Raya Giştî û Navneteweyî

Bi qetilkirina Jîna Emînî re, gelek rêxistinên mafê mirovan, fanînîst, tevgerên jin û tevgerên azadîxwaz li hember rêjîma Îranê helwest nîşan dan. Gelek rapor ji Raya Giştî û navneteweyî re hatin şandin û daxwaza avakirina komîteyên lêpirsîn û hesabxwestinê ji Îranê hatin kirin. Helbet ev yek jî bi cidiyetbûn û dengvedana vê serhildanî li hemû cîhanê wiha bû. Rîjîma Îranê di doza Jîna Emînî de xwest gelek leystûkan bike, yek ji wan jî ku piştî sê rojan di nexweşxaneyê de ma, di rapira nexweşxaneyê de hatibû destnîşankirin ku Jîna bi awayekekî xwezayî jiyana xwe ji dest da ye. Lê her kes dizane ku Jîna ji ber îşkenceyê û lêdanê zirar gihîştibû laş û lapatatên wê. Raya Giştî û navneteweyî li hember bûyera Jîna Emînî nebû bersiv. Rûxmî ku weke bûyer hemû pêvanên mirovahiyê derbas dike û di encama tundiyê de hatiye qetikirin û piştî wê bi sedan rojnamevan, siyasetmedar û xwendekar hatin girtin û darvekirin, lê raya giştî bê helwest ma û helwesta ku raber kiriye jî ne têrker bû. Ger heyanî niha ev doz hatiye girtin û weke ku bûyerek bû û derbas bû, bêyî ku hesab ji dewletê bê xwestin. Her wiha ger heya vê kêliyê jin di Îranê û Rojhilatê Kurdistanê de tên darvekirin, kuştin û îşkencekirin wê demê tu bandora Raya Giştî li ser rêjîma Îranê nîn e. Ger doza Jîna Emînî bê hesabxwesrin hat definkirin, wê demê ev dibe sedem ku wê jin di Îranê de hîn zêdetir rastî kiryarên zihniyet û rêjîmê bên, bêyî ku sûcdar bên cezakirin, weke ku em îro ji bûyerên ku diqewimin re dibin şahid.



# Hîmên wêjeyê

Çîroka her tiştî heye û çîrok dibe bingeha helbest, destan û hwd. Mirov dikare bibêje ku çîrok dayika wêjeyê ye.

**Navenda Nûçeyan**

Wêjeya devkî ya kurdan bêhtir dengbêjî ye. Helbet çîrokbêjî, destanbêjî, metelokgotin, helbestxwendin û awazên zêmarî û hwd. jî hene. Rastiyeke din jî heye ku bingeha gişan çîrok e. Çîroka her tiştî heye û çîrok dibe bingeha helbest, destan û hwd. Mirov dikare bibêje ku çîrok dayika wêjeyê ye. Li civaka kurdan jî wisa ye. Her bûyer bûye çîrok û çîroka her bûyereke biwate heye. Li ser çîrokê helbest, stran û herweha afirîner. Vê jî hişmendiyek di civakê de afirandiye û her civakê li gorî vê jî teşe girtiye. Hişmendiyên civakê jî ketine wêjeyê û bêhtir jî ketiye wêjeya devkî. Mirov dikare bibêje ku di hişmendiya civakê de bandora mîtolojî, ol û girêdayî vê jî bandora wêjeyî û nexasim jî ya wêjeya devkî zêdetir e. Hût, pîrebok, lehengên çîrokan (Weke Kawa, Ristemê Zal…), xweşmêrên stranan û hişmendiya wan heval û hogirên me yên jiyanê ne. Durustî, xwedîsoz û evîndarî û sekna me ya jiyanê bêyî me şewqdana wan e. Biqasî ku dizanim û tê digihîjim, dixwazim bêhtir rewşa hin stran û kilaman raxim ber çavan.

a) Piraniya wêjeya devkî ya kurdî ji devê jinê ye. Wateyeke vê ya kûr heye. Ji ber ku zimanê kurdî mê û afirînkarê wê jî jin e; stran û kilam bêhtir berhemên wan in. Yeka din jî bi ya min ji serdema bavkanî û bi vir ve, di civaka me de ya ku zêde tahde lê hatiye, pêşiya wê hatiye girtin û xwederbirina wê, xwe îfadekirina wê hatiye astengkirin jî jine û wêjeya devkî jê re bûye qada xwe pêkanîna jiyanê. Ev der jê re bûye qada ku raz û xwestek, xeyal û hestên xwe bide der, bîne zimên, bûye qada ku lê rehet, xweş û serbest bipeyive. Dîsa; jin dilbirehm e, zû kezeba wê diêşe, dilşewat e, li hember bûyeran zêdetir hestiyar e; ji ber vê yekê dê ye, xwişk e û ya herî girîng jî evîndar û dilbikul e. Ya ku qedrê evînê zêde dizane ew e. Mêyî bingeha, hestiyarî, dilşewatî û dilbirehmiyê ye, ji hovîtiyê dûrketin e. Ji ber ku dil di aliyê çepê de ye, havênê çepiyê di dilî de dimeye û dil mê û her dil dilê jinê ye.

b) Di rewşa serhildêrî û têkçûnên serhildanên Kurdistanê de gelekî raz û sembol afirîne ku bûne bingeha derûniya civaka kurdan. Weke di strana "Bavê Lalo"yê de awaza, "Ez nakevim ber kuştina Bavê Lalo, kuştin karê mêra ye. Lê destên çolix û çoçixên Bavê Lalo xistine kelemça lingê wan dane qeydan, berê wan dane hepisxana Qerepêtê (Xerpêt) û qûnbicilikên cendirma bi qûndaxan li wan dixin, dibên 'de haydê kurdo yurî', mala min…" Di vir de welatparêziyeke xurt ku mirov dikare bibêje ku dendika welatperwerî û niştimaniyê heye. Hezkirina axê û welêt bingeha vê ye û ji dil difûre bi zar û dilê jinê. Hêjayî gelek lêkolîn û şîroveyan e. "Haydê kurdo yurî" û "Qûnbicilkên cendirma" ne hestên ji rêze, eşîrî û malbatî ne. Nirxandina vê fireh û mijara nivîseke din e û hêja ye lêkolînên civaknasî.

Dîsa di strana "Seyitxanê Ker" de awaza, "Berê tivingê xwe nedin eskeran ew guneh in, lawên xelkê ne, çavê dê û bavên wan li riya wan e, berê tivingên balçîqan bidin yûzbaşî û bînbaşiyan û ritbeliyan, şewqeyên wan bigindirînên binê di bestan e…" Di vir de bîrûbawerî û hestên gelêrî yên kûr hene. Ji gel, xizan û feqîran hezkirin ku di şerî de di heyamên mirin û jiyanê de tê der, wiha tê zimên, mirovî diheyirîne. Ka xwedêgiravî kurd "hov"bûn! Ji aliyê çînayetiyê bigirin heya mirovhezî, yanî hûmanistiyê gelek tîrêjên derûnî, zanistî yên mirovahiyê hene di vir de. Weke ku Xaniyê pîroz tovên mirovahiyê di dil û mejiyê civaka xwe de di kûr de û xweş çandibin, beriya Şoreşa Fransayê ya bi nav û deng ku Rojavayî pê difirin! Îro jî lehengên Zagrosan bi bingeha mirovheziyê têdikoşin û weke kal û pîrên xwe heya ku ji wan tê ji kuştina lawên gel û gelan direvin. Bi bîr û baweriya Rojê û civakparêziyê, bisebr û qinyata axê, ew axa bingeha mirovahiyê ya Hîlala Bibereket jiyanê dirêsin li ser esasê Komageneyî. Li ser van mijaran lêkolîn karê beşên zanîngehan ên civaknasiyê ne. Em bêheq nafikirin û nabêjin ku ev civak havên û hevîrê mirovahiyê ye.

c) Wexta ku mirov li strana "Gulê mehrûmê" guhdar dike; hîs dike ku hesreta welêt jî difûre. "Lê lê Gulê mehrûmê welat welatê me dûr e, bêyî te li xerîbiyê ez ê sebra dilê xwe bi kê bînim". Êşa xerîbî, xizanî, bindestî û koçberiyê, deranîna rewşa xweza û çiyê di vê stranê û yên mîna wê de mirovî mat dike. Tu destanbêj nikarin avê li destê vê hunerê û hunermendê/a wê bikin. Vê nîgar û nexşê hestê mirovan kelandine û heyranî di dilan de kûr kirine. Bêheq em ne evîndarê çiyê, mêrg, deşt, berrî û zozanan in. Tew wersiyona Leyla û Mecnûnê, "Leyl û Mecrûn" şahê berheman e, çi fêde bişaftinê weke ku em ji gelek gencîneyan mehrûm kiribe, ji vê jî bêpar kiriye. Biqasî ku çend xetê wê tê bîra min, ew bi xwe çirûskên feyzê ne; "Mecrûn xulamê mala Leylê ye, kar û barê wan dike, xizmeta mêvanan jî lê ye. Rojekê mêvan gelek tên û Mecrûn ji hal de dikeve. Meseleya ku li cihekî dalde serê xwe datîne ser çoka Leylê û di xewê ve dihere, ji evîn û hesreta kûr ancax piştî heft salan hişyar dibe û li mêvanan dipirse. Bersiv ji Leylê ye;



"Lolo Mecrûno, Mecrûnê rî kurisî
Cedas di qula guh de reqisî
Pezê me çûye zozana
Berxê me bûne berana
Keçê me bûne keybanuyên dîwana
Tu hê dipirsî li halê mêvana…"

Yan jî dewlemendiya vegotina "Bajarê Mixurbê" ya di destana "Memê Alan" û hwn…

"Bajarê Mixurbê bajarekî pir giran e
Li ser heft çiyan e
Li ser sê sed û şêst û şeş deriyan e
Her derî li ser sê sed û şêst û şeş mihelan e
Temam di destê Elî Begê, Emer Begê, Elmaz Begê de ye sê bira ne"

Ev wersiyona devkî ya herêma me bû, dîrêjiya wê hejayî lêkolînê, dewlemendiya vegotinê mirov li erd û ezman digerîne, jiyaneke nû û bêhempa dide sêwirandin û sînoran ji xeyala mirovî radike, nêrîn û ramana mirovî, bêhna mirovî fireh dike. Hebûnê pîroz û fireh dike. Yên ku ji bîra me hatine şûştin jî tiştekî din.

d) Ka em ê awaz û bingeha felsefeya Feqiyê Teyran'î a di "Şêxê Sen'an"ê de çawa şîrove bikin! Di wê demê de dibe ku bûyerek weha çêbûbe û bûbe kilam an jî helbest, ji loma Melayê Cizîrî jî bahsa vê dike; di helbesteke wî de weke îmge û bibîrxistin derbas dibe. Di wê demê de şêwrek weha, hest û ramaneke wiha ji aliyê hestên mirovahiyê hejayî pesinandin û teqdîrê ye. Ev kamilbûna hestên mirovahiyê ne ku îro em li wan digerin û îro şerên olî mirovahî dabe bin lingan, qedrê vê şêwrê hîn bêhtir giranbuha ye! Ev jî mijara lêkolîn, lêgerîn û nirxandinê ye. Erê, Şêxê Misilman dibe evîndarê Keça Fileh, evîndarê rehbika fileh û her tiştî dide ber lingan lê bi mirovahî difire qatê heftan ê ezmanan di wî qirnî, di qirnê 17'an û li vê xakê û li vê civaka ku îro mirovahî qedr nadê û têkoşîna wê ya ji bo nirxên însanî weke terorî dibîne!

Ev bûyer, ev vegotina vê evînê mînaka bêhnfirehî, xweşbînî û qedrdayîna civaka kurdan a evîn, hezkirin û hestên însanî ye ku îro pere û berjewendiyan ew ji wijdanê mirovan paqij kiriye, xwedêgiravî mirovên modern, ên kamil, ên hemdem û humanîst!

Ev demokratî, humanîstî û hejadîtina mirovê/î ye. Vêya hanê jî derûnî û bextê mîrovê kurd kemilandiye, neqişandiye. Zordestî û mêtingeriyê ev herimandibe, ev tiştekî din e. Lê herdem vê şêwra li vê xakê cih û warê şênhatinê dîtiye. Ji ber vê em dibejin ku hest û derûniya mirovahiyê, mirovahî li ser vê xakê veşartî maye, divê em derînin ku tîrêjên rojê maçî bike pîrozî bide wan/wê. Û divê em têkoşîna mirovahiyê ya Zagrosan hê jî xurt û fahm bikin. Em qedrê wan milyaketan baş zanibin, milyaketên hemdemî û yên herdemî.

e) Di stran û kilamên evînî de dil, sîng û ber, memik, cotên zirrmemikan, kilên siphanî û hwd. Serbest û bêsansur derbas dibin. Ev jî asta xweşbînî, xwezayî, mirovahî û humanîstiyê ye, ya dilfirehiyê ye. Ji aliyekî jî işareta nejiyandina van hestan e. Her çi be serbestî hestên wan terbiye û perwerde kiriye.

Ji aliyekî din jî evîna bêdil weke di stran Xalê Cemîl'î de jî tê dîtin nayê qebûlkirin û tê şermezarkirin. Ev jî gihaştina hestên mirovahî û rewşa xweşgotin û rastgotina di civakê de ye.

Dîsa têgehên mîna çarika wê bi ser çavê wê re şer dikir, çarika wê bi xavika wê re şer dikir (ji bo xweşikî û lihevhatin û bedewiya jinê), kezîkurê, porkurê, porkurê por nemayê, desmalsorê gewrê, kirasmelesê, bejndarê, bejn ji taka rihanê û hwd. geşiya wêjeyê ye. Cihdayîna têgeh û îmgeyên razberî yên li gorî rewşa jiyanê, radeya mantiq û felsefeya civakê ya şîroveya jiyanê û asta berziya hest û ramanên cîvakî û bilindiya asta wêjeyê ye. Em dikarin bibêjin ku exlaq, bastan û têkîliyên jiyanî wiha afirîne.

f) Aliyekî neyînî yê wêjeya devkî jî bi ya min, stran û kilamên şerî yên dijminatiya azbet, eşîr û kesan e. Ev bûye sedema perçebûna civakê û pêşiya yekitiyê girtiye. Şerê kozikan ê li hemberî yên ji civaka xwe bûye kurmê darê, bûye bêtifaqî û bûye kurmê hestên neteweyî ku îroj em pir êşê ji ber dikişînin û hertim hev dikujin. Deriyê edoqewmiyê bi van û weha vebûye.

g) Dawî ez dixwazim ku balê bikişînim ser du stranan û rexneyekê bi lêv bikim. Dengbêj carinan orîjînalî û xweseriya stranê diguherin, ev jî wêjeyê bêîtibar dike û dixe rewşa ketberiyê. Strana "Hesnê Mala Mûsa"yê ji aliyê hinek dengbêjan ve weke "Ehmedê Mala Mûsa"yê tê strîn. Ya rastî "Hesenê Mala Mûsa" ye. Bûyer li gundekî (ku ez ne şaş bim, Biloka ye) li herêma Dêrika Çiyayê Mazî ya Mêrdînê çêbûye û di hişê mirovan de zindî ye. Mamoste Adar Jiyan vê meseleyê qenc dizane û di pirtûka xwe ya bi navê "Seyrê" de ev bi ser navê "Hesenê Mûsa û Hedoka Qaso"yê nivîsiye jî. Dîsa strana "Bavê Fexriya"yê weke "Bavê Fexrî"yê tê strîn. Kalê min dengbêj bû û min ji gelek dengbêjên kevn jî (emrê min şêst e) guhdar kiriye, Bavê Fexriya paşê bû Bavê Fexrî. Ji bo rêzdayinê ez dibêjim ku baldarî pir girîng e ku orîjînaliya hunera me xera nebe.

Wêjê û nexasim jî wêjeya devkî, mirov dikare bibêje ku havênê hişmendiya civakî ye. Hebûna civakê ya civakî distirê.

# ‘Em ê çandiniya avî çalak bikin’

Hevserokê Komîteya Çandiniyê ya kantona Cizîrê Sozdar Biro diyar kir ku ew hewledanên pir mezin dikin ji bo peydakirina pêdiviyên cotkaran û wiha got: “Di sala nû ya çandiniyê de wê mazot li ser 6-7 caran li cotkaran were belavkirin û em ê çandiniya avî aktîv bikin.”

**Viyan Egîd/Qamişlo**

Çandinî ji bo berdewamkirina jiyana mirovan jêdereke bingehîn e, çandinî ji bo peydakirina pêdiviyan, xwedî roleke sereke û pir girîng e. Weke her civakek ku aboriya xwe bi çandiniyê ava dike, li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî piraniya gel bi çandiniyê mijûl dibin. Berhemên sereke ku di vê herêmê de tên çandin genim, ceh û nîsk e. Herwiha rêjeyek kizbera, nok, kemûn û reşreşkê jî tê çandin. Lê îsal ji ber barana kêm tevahî cureyên çandiniyê zerareke mezin dît û saleke hişk û bê berhem bû.

Derbarê rewşa çandiniyê ya li Herêma Cizîrê, Hevserokê Komîta Çandiniyê ya Herêma Cizîrê Sozdar Biro ji Rojnameya me re axivî.

**‘Cizîr bi ax û ava xwe dewlemend e’**

Sozda Biro di destpêka axaftina xwe de wiha got: “Kantona Cizîrê û tevahî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi çandiniya xwe tê nasîn, di heman demê de bi ax û ava xwe dewlemend e, em jî hewl didin ku çandinî bi awayekî hîn xurtir li herêmê pêş bixin. Heta ku gelek cotkar hene, dev ji karê xwe berdane û nema bi karê çandiniyê re mijûl dibin, em niha hewl didin ku van cotkaran vegerînin karê wan da ku çandiniyê bikin. Di herêmê de çiqas hijmara cotkaran zêde be, ewqas ji bo pêşxistina çandiniyê baş e. Sedema ku çotkar dûrî karê xwe yê çandiniyê ketin ew e ku pêdiviyên çandiniyê ne dihatin peydakirin, mîna semad, derman, mazot û tov, ev dibû astengî li pêşiya cotkaran. Heya astekê me karîbû pêdiviyên çandiniyê ji bo cotkaran bidin peydakirin.”

**Piroje**

Sozdar balişand ser pirojeyên enerjiya rojê û wiha got: “Di nav pirojeyê me yê îsal de, em hewl didin ku cotkar bigiştî bîrên erdan li ser enerjiya rojê bi kar bînin ku êdî mijarên mazotê ji hole were rakirin, di rastiyê de enerjiya rojê wê zêdetir bi cotkaran re bibe alîkar. Ji bo belavbûne mazotê jî di salên borî de li ser 3-4 caran mazot ji cotkaran re dihat belavkirin, lê îsal mazot wê nêzî 6-7 caran were belavkirin. Di zivistana derbasbûyî de ji ber nebarîna baranê zerareke mezin li çandinî û cotkaran hat kirin, di heman demê de gelek nexweşî di erdan de derketin. Bêguman her sal Desteya Çandinî û Avdaniyê bar digire ser milê xwe. Di dema heyî de di rêya bernameya ilktronîk cotkar dikare navê xwe qeyd bike û berhemên xwe bide. Herwiha pirojeyên demên pêş hene ku em tovên nû derbasî herêma xwe bikin, tenê li ser genim nemînin, ev yek salên berê me dixwest em pêk bînin, eger erda herêmê tenê genim were çandin, ev yek nexweşî jî ji erda çandiniyê re çêdike û berhemên çandiniyê jî wiha kêm dimîne, lê herêm di nava dorpêçekî de bû, ev jî dibû asteng li pêşiya me. Berhemên sereke ku di vê herêmê de tên çandin genim, ceh û nîsk e. Herwiha rêjeyek kizbera, nok, kemûn û reşreşkê jî tê çandin. Lê îsal ji ber barana kêm tevahî cureyên çandiniyê zerareke mezin dît û saleke hişk û bê berhem bû.”

**Rewşa pembo**

Biro da zanîn ku rewşa çandiniyê bi rewşa hewayê ve girêdayî ye û wiha domand: “Li giştî duniyayê rewşa hewayî bandora xwe li ser çandinyê dike, hem neyinî û hem jî erênî. Ji ber vê yekê îsal pembo di rewşekî pir zehmet re derbas bû, pileya gernmahiyê zêde bû. Ev germahî jî bandora xwe ya neyinî hebû, ji ber di dema ku pembo kulîlkan dide dihêle ku ew kulîlk helweşe, dema ku kulîlk çênabe zerarekî mezin li ser berhem tê çêkirin. Di aliyeke din jî erêniya germahiyê jê heye, ku nahêle nexweşî derkevin, kêzik, mêş û kurim di nava erdê de namînin. Ji bilî van jî îsal me nikarîbû ji cotkaran re tovê pembo bidin peydakirin, ev jî bû asteng li pêşiya cotkaran, ji ber vê yekê cotkar neçar dimîne ku ji derve tovan bigre, lê nayê diyarkirin ew tov baş e, nayê xuyakirin ku erd wê ew tov bide qebûlkirin ya na, ev dibe sedem ku gelek caran berhem ne bi sûd derkeve û bê encam be. Lê îsal em hewle didin ku hemû pêdiviyên cotkaran pêk bînin. Bêguman di vê salê de nêzî 7 hezar donim pembo hat çandin. Herwiha ji bo buhaye pembo jî heya niha nehatiya diyarkirin, em niha li ser buhaya pembo nîqaşê xwe dikin, lê di demeke nêz de wê were eşkerekirin.”

**Sewalkarî**

Soadar Biro di berdewamiya axaftina xwe de behsa zerare li sewalkariyê jî kir û wiha pê de çû: “Di nav van salên zuha û nebarîna baranê de,



zerar ne tenê li ser çandinyê hat kirin, lê belê li ser sewalkariyê jî zerarekî mezin bi xwe re anî, gelek malbatên ku sewal xwedî dikirin, ji neçarî piraniya wan sewalên xwe firotin, ji ber ku êm kêm tê peydakirin û di heman demê de bi nirxekî buha tê firotin. Ji bo ku em nehêlin ev rewş dubara bibe ku rewşa çandinî û sewalkariyê zerarê nebîne me tedbîrên xwe baş girtiye ji bo sala nû a çandiniyê, di nava bernameyên me de yên îsal ku em çawa berhemên êm derbasî herêmê bikin û were çandin.”

**‘Em ê baweriya xwe bidin erdên avî’**

Hevserokê Komîta Çandiniyê ya Herêma Cizîrê Sozdar Biro di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Ji pirojeyên çandiniyê pêwîst e planên istratîjî hebin, salên ku berhemên çandinîyê kêm be, tedbîrê wê hebe mênaka herî nêz ev sal bû ku berhemên çandiniyê kêm bû, lê me tedbîrê xwe girtibû, di deboyê me de miqdarekî baş ji genim hebû. Hazirtiyê me ji bo van rewşên wiha hebû. Lê di demên pêş de pêwîst e em baweriya xwe bi barîn baranê neyinin, ku hîn zêdetir baweriya xwe bidin erdên avî da ku berhem û rewşa çandiniyê bi awayekî serkeftî û bi sûd derkeve.”

## Xwenasîn



### Hevgirtina civakî û avakirina pêşerojê

**Rohat Bulut**

Di roja me ya îro de, civak bi gelek pirsgirêkên wekî aborî, civakî û çandî re rû bi rû dimînin. Bi taybetî jî herêm û welatên ku şer û alozî lê hebe ev şert û mercên jiyanî gelekî dijwar dibe. Ev şert û mercên dijwar dikarin kalîteya jiyana kesan û civakan kêm bikin û di heman demê de zirarê bidin hêviyên ji bo pêşerojê. Lêbelê, dîrokê nîşanî me daye ku hevgirtina civakî û hêza çalakiya kolektîf di nav rewşên dijwar de di nav rêbazên herî bihêz de ne ji bo ji nû ve avakirina pêşerojê. Bi taybetî jî ev çanda hevgirtinê ya civakî li Rojhilata Navîn pir xurt e. Di roja me ya îro de jî ya ku herî zêde pêdivî pê heye ev.

Di serî de ji bo derbaskirina astengiyên li pêşiya pêşkeftina civakî, girîng e nasname, ziman û çand were parastin. Ziman û çand hêmanên bingehîn ên bîr û hebûna civakê ne. Windabûna wan ne tenê tê wateya qutkirina têkiliyên bi rabirdûyê re, lê di heman demê de tê wateya tune kirina pêşerojê jî. Ji ber vê yekê, parastina nirxên çandî û civakî ji bo pêşerojeke azad pîvane sereke ye. Di roja me ya îro de heke pergal, hêzên serdest û rejîmên faşîzan ku dikarin şeran pêş bixe û neliheviyê di navebara gelan de biafirîne, sedema wê ji windakirina çandî ya bi hevre jiyanê digire. Gelên kurd, ereb, tirkmen, suryan, asûr, ermen, cihû, mesîhî bi hezaran salan e ku kerîne bi hev re bijîn. Lê rejîm û desthilatên heyî her tim xwestiye vê çanê tune bike û zimanê çareseriyê ji holê rabike ku li holê civakbûnê nehêl e.

Têkoşîna azadiyê bêguman gelekî pîroz e. Azadî ne tenê mafekî takekesî ye; ew di heman demê de mafê hemû beşên civakê ye ku xwe îfade bikin, mafên xwe biparêzin û di şert û mercên dadperwer de bijîn. Pêşerojeke azad tenê di rewşeke ku her kes xwediyê mafên wekhev be û li gorî nasname yan jî çanda xwe ku rastî cudakariyê neye pêkane. Ji bo gihîştina vê armancê, divê beşdariya civakî were zêdekirin, divê derfetên perwerdehiyê bi awayekî wekhev werin belavkirin û divê pergalên dadweriyê werin xurtkirin. Îro ya ji bo tevahiya Sûriyeyê û bi taybetî jî Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê pêwîst ev e.

Ji bo wê jî lazime zêdetir diyalog hebin, danûstendin xurtbin. Civak, gel û nûner û pêşengên gelen dikarin bi xwe pirsgirêkên xwe çareser bikin. Yanî, afirandina hawîrdorên diyalog û lihevhatinê ji bo dîtina çareseriyên mayînde ji bo pirsgirêkên civakî girîng e. Afirandina erdnîgariyek ku komên etnîkî, çandî û civakî yên cûda dikarin bi aştiyane bi hev re bijîn, tenê bi rêzgirtin û têgihîştina hevbeş pêkan e. Di vê pêvajoyê de, saziyên dewletê, rêxistinên civaka sivîl û kes divê berpirsiyariyên xwe bicîh bînin û pêşî li polîtîkayên cudakarî û marjînalîzekirinê bigirin.

Li hemberî şert û mercên dijwar, divê civak bi giyanekî hevgirtinê tevbigerin, ziman û çandên xwe biparêzin û ji bo pêşketinên civakî rêbazek çareseriyê bipejirînin. Avakirina paşerojek azad û dadperwer pir girîng e. Afirandina hawîrdorek aştiyane û geşbûyî ku mirov bikaribin bi hev re bijîn ji bo siberoja mirov û civakê girîng e.

# Yek ji taxên kevnar ên Qamişlo: Enteriyê

**Hevî Keleş/Qamişio**

**Taxa Enteriyê yek ji taxên kevnar yên bajarê Qamişlo ye û dikeve rojavayê bajêr, ew taxeke gelerî ye û bi civakbûyîna niştecihên xwe tê nasîn.**

Yek ji kevintirîn taxên bajarê Qamişlo Taxa Enteriyê ye, ev tax dikeve rojavayî bajêr û dîroka avabûna wê vedgere beriya avabûna Qamişlo. Taxa Enteriyê ji hêla xaniyên xwe yên kevin û xelkên xwe yê berxwedêr û têkoşer, herwiha hezkirin xelkên wê ji hev re û alîkariya wan bi hev re te naskirin. Ev tax yek ji taxên gelêrî yên kevnar ên Kurdan e.

**Navlêkirina Taxa Enteriyê**

Li gorî ku tê gotin, di destpêka avabûna Enteriyê de, yek ji niştecihên wê ku navî wî Farisê Berazî bû, ew yekem kes bû ku jînatorê elektirîkê bikar anî û lempên şewqê ji bo ronahiyê bikar tanî, ji ber wê xelkê jê re digotin ew gundê bi Enterîk û bi demê re navê wê bû Enteriyê.

Tevahî kesên ku di destpêkê de di taxa Enteriyê de bicih bûne ji eşîrên Mihacira, Berazî, Erebiya, Mihelmî û Çêlikî ne, wê demê ew ji gundên li derdora Qamişlo hatine û li Enteriyê bicih bûne. Di taxa Enteriyê de tê texmînkirin ku derdora destpêkê derdora 200 malî hebûn. Lê niha jimara niştecihên taxê pi zêde bûye û li taxê 12 komîn hatine ava kirin. Enteriyê taxeke ku xelkên wê bi awayekî komînal bi hev re jiyan dikin ku hevkarî di navbera wan de heye ji dema ku tax hate avakirin û heta niha ji nifşekî ber bi nifşekî ev urf û adet bi wan re dimîne û li ser mezin dibin.

**Xelkên Taxa Enteriyê bi qehremanî û berxwedaniya xwe tên naskirin**



Gelek urf û adetên ku kurd bi wan tên naskirin li vê taxê belav bûne, wek hevkarî û hezkirina ji hev re. Piraniya şêniyên taxê yên resen kedkar û cotkarin, wan ji bo debara jiyanan xwe kar dikirin. Ji taybetmendiya vê taxê qehremanî û berxwedaniya xelkên wê taxê ye, gelek xort û keçên ji vê taxê tevlî Tevgera Azadiyê bûne, herwiha bi sedan ciwanên taxê ji bo parastina xaka xwe û hesreta azadî û jiyaneke bi rûmet tevlî YPG, YPJ û QSD’ê bûne, bi dehan şehîd ji vê taxê hene. Yek ji wan Şehîdan ku yekem Şehîdê taxê ye Şehîd Reşo Silêman e ku sala 1989”an de li çiyayên azad di nava Tevgera Azadiyê de şehîd bûye.



# Li Rojava yekemîn dezgehên ragihandinê yên nivîskî

Şoreşa ku bûye deng û vîna gelan, beriya 14 salan ji bo jiyana azad û demokrasiyê dest pê kir. Rojnameya Ronahî û Ajansa ANHA'yê yekemîn şahidên ku ev têkoşîn û berxwedanî gihandine cîhanê û bûne dengê rastiyê.

**Esma Miştefa/Qamişlo**

Di vê raporê de em ê ji yekemîn dezgehên Ragihandina Azad ku bi Şoreşa Rojava re hatine avakirin û ber bi roja îro ve herikîne bikin. Di destgirtina vê mijarê de me xwest em balê bikşînin ser destkeftiyên ragihandina azad di şoreşê de û keda ku hatiye dayîn heyanî ku gihîştiye vê rojê. Ji wê zêdetir em ê ji devê kesên ku di damezrandina van dezgehan de cih girtine, çîrokên avakirin û keddayîna ku hatiye kirin bibhîsin.

Yekemîn dezgehên ku bi şoreşê re bi zimanê Kurdî û Erebî weşana xwe destpêkirine Rojnameya Ronahî û Ajansa Nûçeyan a Hawarê ANHA bûn. Bi van her du mîrasên ragihandinê me dest pê kir û îro gelek TV û Radyo li ser şopa heqîqetê kar û xebatên xwe didin meşandin.

**Rojnameya Ronahî**

Rojnameya Ronahî ji yekemîn dezgeha Ragihandina Azad ku li Şoreşa Rojavayê Kurdistanê dest bi kar û xebatê kir. Rojnameya Ronahî bi aloziya Sûriyê re yekemîn gav li bajarê Helebê ji bona bingehê ragihandina azad avêt. Di 16’ê Cotmeha 2011’an de bi komek ku ji çend kesan pêk dihat û bi derfetên kêm dest bi kar û xebata xwe kirin û ev 14 salên ku weşana xwe bênavber didomîne û bû yek ji hîm û destkeftiyên şoreşê. Di parastina rojnamegeriya nivîskî de Rojnameya Ronahî bûye dergeha yekemîn û heyanî vê kêliyê jî weşana xwe berdewam dike. Rojnameya Ronahî bi çend endaman dest bi kar kir, lê îro bûye xwedî gelek nûçegihanên ku li seranserî Bakur û Rojhilatê Sûriyê kar û xebat dikin. Rojnameya Ronahî bi du zimanan weşana xwe dike, beşê erebî di hefteyên de 6 hejmar têne amedekirin û ji wan jî 2 hejmar bi rengekî kaxezî têne çapkirin û beşê kurdî jî hefteyê 2 hejmar bi rengekî kaxezî têne çapkirin.

Yek ji damezrînerên destpêkê yên Rojnameya Ronahî Mamoste Cemîl Reşîd li ser şert û mercên destpêkê yên kar û xebata Rojnameya Ronahî, giringî û astengiyên heyî bi mere parvekirin.

**Bi giropek rewşenbîrên Kurd li Helebê fikra Rojnameyê, derket**

Cemîl di destpêkê de bal kişand ser fikra ku rojname bi wê destpêbûye kir û wiha anî ziman: “Di destpêka xwepêşandanên Sûriyê yên ku di Adara 2011’an de rûdane. Em komek ji rewşenbîrên Kurd li Helebê civiyan û me dît ku pêwîste roleke me jî di avakirina



**Cemîl Reşîd**

civakê de hebe. Bi qasî ku em bikaribin dengê gelê xwe derxînin pêş û bighînin raya giştî û cîhanê, bi qasî wê em dikarin pêşengiya civakê bikin û xwedî li civaka xwe derkevin. Girêdayî vê yekê gelek nêrîn û hizrandin çêbûn û me got ku divê di aliyê ragihandinê de em vê gavê pêş bixînin. Di dawiya meha Nîsanê de ev fikir destpêkir û rojane girêdayî vê yekê nîqaşên me pêşdiketin. Ramana damezrandina rojnameyê derket ku em hêza xwe ya nivîsandinê, analîzkirina pêşketin û rûdanên ku dibin, xwestek û daxwazên gelê Kurd, her wiha derxistina rastiya ku qaşo weke şoreş destpêbûye em biteysînin. Em derdorê 6-7 kes bûn û biryara derxistina Rojnameya bi navê Ronahî hat girtin. Bêguman gelek nîqaş derbarê navarok, terz, şekil, armanc, belavkirin wê çawa be pêş ketin, civîna destpêkê nêzî 12 demjimêran dirêj kir. Di komîteya me ya damezrîner de hevalên ji Efrîn, Heleb, Kobanê û Cizîrê jî hebûn.

Di wê demê de me destûr ji Mala Bedirxaniyan girt, yek ji neviyên wan li Ewropayê bû me destûr ji wan xwest. Li sûriyê di sala 1942’an de heke ne bi rengê Rojnameye fermî be jî bi rengê biroşorekî bi navê Ronahî dihate çapkirin”.

**Hejmara yekemîn, çapkirin û makenîzmeya rojnameyê**

Cemîl girêdayî kêliyên weşana destpêkê wiha got: “Hejmara nivîskaran pir kêm bû, me hewil da rewşê ji hemû milî ve bişopînin, lê herî zêde me giranî dida rewşa gelê Kurd di Rojavayê Kurdistanê de. Hejmara yekemîn ji Rojnameya Ronahî di 16’ê Cotmeha 2011’an de derket ronahiyê û bi wê gavê re rondik ji çavên me bariyan. Dîzayînkarê me yek bû û di wan deman de gelek zehmetî dihatin kişandin, herwiha girêdayî çapkirina Rojnameyê jî wê demê zehmetî hebûn, ji ber ku çapxaneyên me yên mezin tunebûn û rejîma Baas jî qebûl nedikir ku em di çapxaneyên wan rojnameyê çap bikin. Angu Rojname ji amedekirina wê heyanî çapkirina wê hemû bi ked û westandinek mezin dihate kirin û gelek caran em dimane heyanî nîvê şevê û nedirazan heyanî ku me rojname bi dawî dikin. Hejmara yekemîn nêzî 100 hejmarê hate çapkirin û



**Ekrem Berekat**

me bi destê xwe belav kir. Heyanî hejmara 10’emîn bi rengê reş û spî rojname dihate çapkirin, piştî wê me makîneyek bi reng peydakir û me rûpela yekemîn bi reng derdixist. Rojname di destpêkê de rûpelên wê biçûk bû û fontê wê jî wiha bû, gelek rexne dihatin kirin, lê derfetê di destê me de wê demê ew bûn.

Rojname heyanî hejmara 10 tenê bi Erebî dihate weşandin û heftê carekê dihat çapkirin û ji 12 rûpelan pêk dihat. Piştî hejmara 10’ê beşê kurdî jî li Rojnameyê hate zêde kirin û ew jî ji 8 rûpelan pêk dihat. Naverok jî wiha bû (Manşet, nûçeyên herêmî, lêkolîn, polîtîka, nûçeyên Kurdistanî, civak di nav de jin û ciwan, çand, aborî, fikir û rûpela rengereng) heyanî 2013’an rojname bi vê rengî derdiket û li kêlek wê kovara zarokan bi navê Mizgîn dihate amedekirin û çapkirin. Hêjayî bibîrxistinê ye ku wê demê li Heleb, Efrîn, Kobanê û Cizîrê dihate belavkirin”.

**‘Koma destpêkê bi dildarî kar û xebat dida meşandin’**

Cemîl Reşîd di berdewamiya axaftina xwe de ev yek anî ziman û got: “Piştî em derbasî Efrînê bûn êdî hejmar heftê 2 caran dihate çapkirin û kom fireh bû û li Qamişlo jî navend hate vekirin û kar li wir jî hate tenzîmkirin. Ji sala 2013’an ve rojname li Qamişlo bi rûpelên mezin û mîna rojnameyên fermî dihate çapkirin, lê li Efrînê ji ber ku derfet nebûn hîn bi rûpelên biçûk dihatin çapkirin. Di sala 2016’an de çapxaneya Ronahî li Efrînê hate vekirin û rojname li wir bi rûpelên mezin hate çapkirin. Rojnameya Ronahî di hemû qad û pêvajoyên şer û aştiyê yên herêmê û Sûriyê de bi rola xwe lîst. Ji Şoreşa Rojavayê Kurdistanê re bû bersiv û barekî giran rakir ser milê xwe û heyanî îro jî vî erkê xwe pêktîne”.

**Ajansa Nûçeyan A Hawarê ANHA**

Ajansa Nûçeyan a Hawarê (ANHA) di 1’ê Adara sala 2013’an de hatiye avakirin. Li Bakur û Rojhilatê Suriyeyê, li parçeyên din ên Kurdistanê û Rojhilata Navîn bûyer û geşedanên diqewimin, radigihîne. Yekemîn navenda Ajansa ANHA’yê li bajarê Qamişlo hat avakirin û dest bi weşana xwe ya Kurdî û Erebî kir. Ajansa ANHA weke navend li bajarê Qamişlo ye û li hemû bajarên herêmê xwedî navend û nûçegihan e. Niha ANHA bi 6 zimanan weşana xwe dike (Kurdî, Erebî, Tirkê, Ingilîzî, Ispanî û Rusî).

**Yek ji damezrînerên Ajansê Edîtorê Beşa Erebî di ANHA’yê de Ekrem Berekat ji Rojnameya me re kêliyên avabûnê û heya roja îro anî ziman.**

Rojnamevan Ekrem wiha dest bi axaftina xwe kir: “Peyva gelê Kurd ya “Ji tunebûnê hebûn avakir” em dikarin di şexsê Ajansa Hawarê de bidin îfadekirin. Ji ber tu zemînekî ragihandinê di nava gelê Rojava de tune bû. Şoreşa 19’ê Tîrmehê ew berdewamiya Şoreşa Buhara Gelan a ku di Rojhilata Navîn de hatiye destpêkirin bû. Lê belê ew şoreş şoreşekî seqet bû. Di nav van şoreşan de hebûna gelê Kurd nedihat dîtin û di ragihandinê de jî wiha bû. Di ragihandinên di bin siya desthilatdariyê de bû, bi tu awayê behsa gelê Kurd nedihat kirin. Bi şoreşa 19’ê Tîrmehê re me cihê xwe di xebata ragihandinê de girt û piştre me dît ku tenê di hinek saziyan de karkirin, têrê nake û pêwîstî bi saziyên fermî hat dîtin. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê yekemîn Ajansa nûçeyan ANHA di 1’ê Adara 2013’an de vebû”.

Ekrem li ser kêliyên destpêkê yên ku têde Ajans hate avakirin axivî û got: “ANHA bi armanca ku kar û xebatên dîrokî bigre ser milê xwe hatiye avakirin. Bi kêm derfet û îmkana ku tu zemînekî ragihandinê nîn bû, her wiha kesên ku ragihandin xwendine û profesyonalin jî nînbûn. Bi tecrûbeya hinek hevalên ji Bakur, Başûr, Rojhilatê Kurdistaê û Ewropayê xebat hat meşandin. Bi insiyatîfên kesayetî ji komek hevalan ku ne cih hebû, ne alavên ragihandinê hebûn, her tim di hewildan û lêkolîna ku em çawa destpêbikin de bûn. Helbet ev yek bi saya Tevgera Azadiyê û felsefeya Rêber Apo dest pê bû. Ji ber ragihandina ku hatiye avakirin Ragihandina Azad bû ya ku li ser mîrasê Mazlûm Doxanan hatiye avakirine. Ji wan derfetên biçûk ku ji xaniyekî axî me destpêkir, di nava gel de baweriyek avakir û berdevkiya gel kir. Di 2014’an de li hemû herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê navend hatin avakirin û hemû endam bi rengekî dildar kar û xebat didane meşadnin”.

**‘Ragihandina Azad têkoşîna gelê Kurd belavkir û gihande cîhanê’**

Ekrem di dewama axaftina xwe de got: “Bi van gavan re erka me zêdetir bû, bi taybet di aliyê Raya Giştî û ragihandina rastiya ku tê jiyankirin de. Ger berê digotin Kurd hene an nîn in, êdî mecbûr man bêjin Kurd hene. Ragihandina Azad têkoşîna gelê Kurd belavkir û kir malê cîhanê. Rojnamevanên ku tevlî kar dibûn weke şoreşgerekî kar dikirin. Ne tenê ji bo gelê Kurd berdevkiya hemû pêkhateyan dikirin. Di vê oxirê de 6 Xebatkar û nûçegihanên ANHA’yê Şehîd bûn. Yekemîn heval Dilîşan Îbiş ku her tim ji bo azadiya jin kar dikir, di heman demê de li hember DAIŞ’ê bi kamîreya xwe şer kir, her wiha heval Hogir Mihemed, Rizgar Denîz ku ji Mexmûrê bû, hevalê me Said Ehemd di êrişên dagirkeriyê yên Serêkaniyê û Girê Spî de Şehîd bû, piştî wê rêhevalê me Îsam Abdullah di êrişên dagirkeriyê li ser binasaziya herêmê de Şehêd bû, herî dawî jî rêhevala me Cîhan Bilgîn ku ji Bakurê Kurdistanê bû di Berxwedana Bendava Tişrînê de hat hedefgirtin.

Bi saya van lehengan û bi xebata ku hatiye maşandin, Ragihandina Azad deng li cîhanê veda. Ajansa Hawarê bûye ajanseke cîhanî ku kî bixwaze di Sûriyê û Bakur û Rojhilatê Sûriyê de bizanibe çi diqewime, li Hawarê vedigere. Herwiha ji milekî din ve jî di pêşxistina zimanê Kurdî de, xwediyê xebatekî girîng e. Rûxmî kêm tecrûbe û teknîk jî lê weşana xwe bi Kurdî destpêkir. Ajansa Hawar xwediyê destkeftî û dîrokeke 12 sala ye ku xwe disipêre şehîdên destpêkê yên weke Gurbetelî ersus, Gulistan Tara, Seyid Evran û Ezîz Koyluoglo. Helbet pirî caran em rastî gelek zehmetî û astengiyan jî dihatin, lê ev yek li pêşiya karê me nebû asteng”.

**‘ANHA; Bûye Ajanseke cîhanî’**

Ekrem Berekat da zanîn ku ew li ser paradîgmeya civaka demokratîk xebatê didin meşandin û wiha pê de çû: “Em li ser baradîgmeya civaka demokratîk xebat dikin. Di astekî cîhanî de kar tê meşandin û rastiyên di cîhanê de diqwimin, tên ragihandin. Bi guhartin û veguhartinên di Rojhilata Navîn de, em hewil didin bi wan guhartinan re gav bavêjin. Li Sûriyê bi taybet heyanî astekê me berdevkiya civaka Sûriyê kir, lê hewildanên me yên dema pêş ku vê yekê xurtir bikin hene. Derdora me gul û gulîstan nîn in, çawa ku gelê me têkoşîn dike em jî vê têkoşînê bi wan re didin meşandin. Êdî em ji vir û pê ve Ajansa Hawarê weke Ajanseke cîhanî pênase dikin”.

# ‘Serkeftina pêvajoya aştiyê bi azadiya Rêber Apo pêkan e’

Endama Insiyatîfa Sûrî Ya Azadiya Abdullah Ocalan ya Helebê Rojyan Hisên diyar kir ku heya azadiya fîzîkî ya Rêber Apo pêk neyê wê gavên erênî neyên avêtin û pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk jî bê encam be.

**Aryen Hesen/Qamişlo**

Di 27’ê Sibatê de banga ‘Aştî û Civak Demokratîk’ ya Rêber Apo daye destpêkirin, hat raghandin. Ev pêvajoya Rêber Apo dengvedaneke cîhanî çêkir û mohra xwe li dîrokê da. Herwiha dewleta Tirk xwest ku PKK’ê jî tevlî vê pêvajoyê bibe û şerê çekdarî rawestîne. Di 12’ê Gulanê de PKK’ê kongreya xwe ya 12’emîn lidarxist û biryara xwe fesxkirinê da. Piştre di 11’ê Tîrmehê de koma aştî û civaka demokratîk meresîma şewtandina çekan lidar xistin. Rêber Apo û tevgera azadiyê erk û piştgiriya xwe ji vê pêvajoyê re nîşan dan. Lê dewlet Tirk heya niha tu gavên ber bi çav neavêtine.

Di derbarê pêşveçûna pêvajoya aştî û civaka demokratîk de, endama Insiyatîfa Sûrî a azadiya Ebdullah Ocelan a Helebê Rojyan Hisên ji Rojnameya me re axivî.

**‘Pêşketinên di serkeftina pêvajoya aştî û civaka demokratîk de yek alî maye’**

Rojyan Hisên destnîşan kir ku dewletên hegemonîk dixwazin dîzayneke nû bidin Rojhilata navîn û wiha pê de çû: “Sedsal ku li ser peymana Saykis-Pîko re derbas bûye, ku çawa dixwazin dîzayneke nû bidin Rojhilata Navîn, wê demê xuya dike ku bangewaziya Rêber Apo ji bo aştiyê û civaka demokratîk, pêkanîna wê û projeya ku li ser esasê demokrasiyê, azadiya jin û ekolojiyê tam di demê xwe de bû. Rêber Apo dibêje; “Di 2013’an de eger me biryara fesixkirina PKK’ê pêk bianiya wê demê minê îxanet li gel û PKK’ê jî bikiriba. Lê di dema niha de guncave, hem ji bo gelê kurd û di heman demê de ji bo gîştî gelên herêmê tam di cihê xwe de hat.”. Piştî 27’ê Sibatê pêvajoyek nû hate destpêkirin, guhertinên nû di nav PKK’ê de hatin jiyîn, di nava doza gelê Kurd de jî, li Tirkiyê, Sûriyê, Îraqê û bandora vê yekê li ser Rojhilatê Kurdistan jî dike. Piştî 27 salan Rêber Apo bi dîmen derdikeve, behsa demokrasiyê, perspektîvên xwe ji bo gel û tevgerê azadiyê rê dike. Piştî lidarxistina kongreya 12 emîn a PKK’ê biryara fesixkirinê û xwe ji nû ve avakirinê didin. Herwiha dest pê kirina koma aştî û civaka demokratîk yê ku ji 30 kesî pêk tê kirin. Lê belê pêşketinên ku di serkeftina pêvajoya aştî û civaka demokratîk de yek alî ma. Di depêkêde dewleta Tirk ev pêvajo erênî girtin dest û qebûlkirin, lê belê ev gotin tenê di siloganan de ma. Heya Roja me ya îro jî tu gavên erênî û ber bi çav ji aliyê dewleta Tirk ve nehatine avêtin. Lê niha dewlet baxçelî guhertinan di daxuyaniyên xwe de derdixwe pêş û le hemberî gelê Kurd derdikeve.”

**‘Ji beriya sed salî ve û heya roja îro rêbazê netewdewlet dimeşîne’**

Rojyen Hisên diyar kir ku ji beriya sed salî ve û heya roja me îro zihniyeta dewleta Tirk yek e û wiha domand: “Eger em vegerin beriya niha bi sed salî, piştî hevpeymana



Lozan û Sayik-Pîkot dewleta Tirk soz dabû ku rêveberiyeke xweser bide Kurdan, lê soza xwe pêk nanî. Eger em li roja xwe ya îro meyze bikin tevgera dewletê xwe dûbare dike. Pêvajoya aştî û civaka demokratîk ya ku Rêber Apo daye destpêkirin, di destpêkê de dewleta Tirk bi rengekî erênî girt dest, lê belê piştî wê heman rêbaza ku berî niha bi sed salî dewleta Tirk daye meşandin, niha jî mîna wê dike. Lê di heman demê de pêvajo, sîstem û rayedarên vê pêvajoyê jî ne yên borî ne. Êrîşên li ser Rojava, hewaldana dagirkirinê, êrîşên dewleta Tirk û çeteyên wê û tevilheviyên ku dixwazin di hundirî herêmê Rojava û Rêveberiya Xweser de çêbikin. Armnaca wan ew e ku pêvajo neçe serî.”

**‘Xwesteka dewleta Tirk ku serdema Osmanî vegerîne’**

Endama Insiyatîfa Sûrî a Azadiya Ebdullah Ocalan Rojyan Hisên axaftina xwe wiha qedand: “Dewleta Tirk û çeteyên wê ne tenê ji bo hebûna Kurd û avabûna neteweke demokratîk êrîş dikin, lê belê rêyên bazirganiyê, sererd û binerdê Sûriyê dixwaze serweriya xwe li ser bike. Xwesteka dewleta Tirk ku serdema Osmanî vegerîne, lê ne bi şêwazê berê. Di Rojhilata Navîn de sê proje hene, Emerîka-Îsraîl, Çîn-Rûsiye, Rojhilata Navîn ya demokratîk, konfederîzma Rojhilata Navîn û yekîtiya komûnên demokratîk ava bibe. Lê pirsa herî girîng gelo Tirkiyê wê kîjan projeyê hilbijêre?

Li gorî mûdexeleya Tirkiyê ji Sûriyê, Felestîn, Îsraîl û Îraqê re naxweze pêvajoyek demokratîk di herêmê de were rûniştandin. Tirkiyê weke hêzekî netewdewlet û netewperest nikare di herêmê de bi vî şêwazî berdewan bike. Mûdexeleya dewleta Tirk ji Sûriyê re ku QSD’ê û Rêveberiya Xweser projeya xwe li hemû Sûriyê nedin belavkirin, ji bo ku Sûriyê di aramî de jiyan neke.

Pêvajoya aştî û civaka demokratîk pêk nayê û ber bi gavên erênî ve naçe, heya ku Rêber Apo di hundirê zindana Îmraliyê de ye. Ji bo vê jî weke Insiyatîfa azadiya Rêber Abdullah Ocelan li Sûriyê, Îraq, Rojhilata Navîn, di heman demê de li hemû welatên Ewropa û Bakurê Efrîka jî kampamyek gîştî ji bo mirovên ekedemisyan, siyasetmedar, rewşenbîr û kesayetên diplomasî ku pêvajoyê bidin guhertin, kampamyek ku ‘dixwzim hevdîtin bi Ebdullah Ocelan re bikim’ di bin vê navê de kampanya tê meşandin. Ev kampanya wê haya 20’ê Îlonê dewam bike. Wê kesayetên navdar nameyekê binivsînin da ku ji rêxistina mafê mirovan, CPT û hikumeta Tirkiyê da ku Rêber Apo ji zindanê derbikeve û pêvajoyê bi rê ve bibe. Heya ku Rêber Apo fîzîkî azad nebe, ev pêvajo bi serî nabe.”



## Bi şivên re digere û gur re dixwe!

**Dilyar Cizîrî**

Di roja 14’ê Îlonê de li paytexta Sûriyê Şamê civînek sosret pêk hat. Ev civîn gotina pêşiyan a dibêje “Bi gur re digere û bi şivên re dixwe” anî bîra min. Civîn di navbera Wezîrê Çandinî û Daristanan ê dewleta Tirk a dagirker Ibrehîm Yumalkî û Wezîrê Çandiniyê yê Hikûmeta Veghuêz a Sûriyê Emced Bedir de pêk hat. A hîn sosretiya mijarê zêde dike, civîna wan qaşo bi armanca “Peymana Hevkariya Çandiniyê” di navbera Sûriyê û Tirkiyê de bi rê ve çû.

Ji sernav gelek pirs derdikevin, dewleta Tirk a dagirker dê çi hevkariyê bi çandiniya Sûriyê û cotkarên wê re bike?. Mane dewleta Tirk ava Çemê Firat û Dicle girtine û bûye sedema daketina rêjeya wan?. Mane dewleta Tirk ava Çemên Xabûr, Çeqçeq, Efrîn, Zurgan, Çircib û bi dehan çem û rûbarên din ên ji aliyê Bakurê Kurdistanê ve tên Sûriyê bi temamî qut kirine?. Ew çemên em behsa wan dikin, hemû jêdera sereke ya çandiniya li ser xaka Sûriyê bûn, bi milyonan donim zevî li ser wan dihatin avdan. Bi sedhezar malbat li ser wê jiyan dikirin. Niha jî bi temamî ziwa bûne.

Dewleta Tirk a ji destpêka aloziya Sûriyê ve destê xwe dirêjî kiriye, di hemû qadên jiyanê de bandoreke mezin li aboriya Sûriyê kiriye. Niha jî dixwaze gelê Sûriyê bi van civînan bixapîne. Dewleta Tirk derveyî berjewendiyên xwe dê tu sûdê li gelê Sûriyê neke. Berûvajî wê bi destwerdana xwe di hemû qadan de ziyan dike. Qutkirina ava stasyona Elok ji sala 2019’an de li gorî yasa û zagonên navdewletî sûcekî şere. Dewleta Tirk ew sûc jî kiriye û zêdeyî milyonek û nîv xelkên Hesekê û Til Temirê bê av hiştine. Dewleta Tirk avê di bendavên xwe de depo dike. Li gorî agahiyên ji Bendavên Firat û Tişrînê tên metirsî li ser herdû bendavan çêbûye.

Di rewşeke wiha de Wezîrê Çandiniyê yê Hikûmeta Veguhêz a Sûriyê bi wezîrê Dewleta Tirk re dicive û pêşxistina çandiniyê li Sûriyê pê re nîqaş dike. Li gorî agahiyên ji hundirê civînê hatin weşandin, Wezîrê Çandinî û Daristanan a Tirkiyê Ibrehîm Yumalkî ji hemû pirsên girêdayî girtina çemê Firatê ji aliyê Tirkiyê ve direviya. Li şûna wê, behsa metirsiyên Tirkiyê yên ji Durziyan li Siwêda û Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ya li rojhilatê Firatê, dikir. Gelo bi van fikaran dê dewleta Tirk çawa piştgiriya çandiniya li ser xaka Sûriyê bike?. Bi rastî dema mirov detayan tîne ber hev bi hêsanî diyar dibe, hikûmeta veguhêz a Sûriyê ji bo dewleta Tirk razî bike, di hemû qadan de serî ditewîne. Bi vê civînê jî dixwazin raya giştî ya Sûriyê bixapînin. Dewleta Tirk wekî xelaskarê Sûriyê di hemû aliyan de nîşan bidin. Di rastiyê de jî dewleta Tirk di warê talan, wêranî û zirardayîna gelê Sûriyê de tu gav paş ve neavêtiye. Tevî wê jî hîn rayedarên hikûmeta veghêz jî di nav de beşek ji xelkên Sûriyê ji dewleta Tirk re li def û zirnê didin.

# ‘Pêwîst e hikumeta veguhêz gavên berbiçav bavêje’

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

**Hevseroka Partiya Têkoşîna Demokratîk Xunav Mele diyar kir ku danûstandinên Rêveberiya Xwesr bi hikumeta veguhêz a Sûriyê re di çend qonaxan re derbas bûne û got, “Astengiyên pêkanîna pratîk û lihevkirina li ser mekanîzmayên destûrî ji aliyê hikumetê ve derdikevin.”**

Di 10’ê Adara 2025’an de di navbera Fermandarê Hêzên Sûriya Demokratîk QSD’ê Mezlûm Ebdî û hikûmeta veguhêz a Sûriyê de peymanek ji 8 xalan hate îmzekirin. Lê tevî derbasbûna 6 mehan di ser peymanê re hikymeta veguhêz pabendê peyamanê nabe û xwe dûr dixe.


Di derbarê danûstandinê Rêveberiya Xweser bi hikumeta veguhêz a Şamê re, hevseroka Partiya Têkoşîna Demokratîk Xunav Mele ji Rojnameya me re axivî.

**‘Danûsatandinên bi hikumeta veguhêz a Şamê re di gelek qonaxan re derbas bûne’**

Xunav Mele di destpêka axaftina xwe de wiha got: “Danûstanên di navbera Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê û hikumeta veguhêz a Şamê de, di çend qonaxan de derbas bûne, di nav de gelek nîqaşên kûr li ser pêşeroja Sûriyê hatin nîqaşkirin. Herwiha bi teybet di derbarê avakirina Peymana Civakî ya nû ku mafên hemû pêkhateyên Sûriyê digire nava xwe, em gihiştin xalan. Di heman demê de,mîsyoneke hevpar bi naskirina mafên xwerêveberiyê, misogerkirina temsîliyeta demokratîk û veqetandina desthilatan ve girêdayî ye, lê hîna jî astengiyên pêkanîna pratîk û lihevkirina li ser mekanîzmayên destûrî ji aliyê hikumetê derdikevin.”

**‘Peymana 10’ê Adarê pêvejoyeke siyasî ya girîng nîşan da’**

Xunav axaftina xwe wiha berdewam kir: “Peymana 10’ê Adarê pêvejoyeke siyasî ya girîng nîşan da, ji ber vê peyamanê deriyê projeya netewî ya berferh vekir. Lê sedema sereke ya têkçûna pêkanîna wê nebûna



îradeya siyasî ye. Herwiha zextên ji aliyên hêzên herêmî û navnetewî yên ku naxwazin ku li Sûriyê projeyeke demokartîk a serbixwe pêş bikeve. Di heman demê de, hikumeta veguhêz a Sûriyê tenê yek rengî û yek hişmendiyê dide meşandin, ev hikumet mafê hemû pêkhateyên Sûriyê di destûrê de paşguh dike. Helbet ev yek astengiyeke pir mezin bi xwe re tîne.”

**‘Aşîtiya rast tenê bi qebûlkirina pirrengiya neteweyî, olî û çandî pêkan e’**

Xunaf Mele eşker kir ku aşîtiya rast li Sûriyê tenê bi riya pêvejoya siyasî ya berferh ku pirrengiya neteweyî, olî û çandî qebûl dike, wê pêk were û wiha pêde çû: “Di vê demê de, pêwîst e nivîsandina destûreke ku mafê hebû pêkhateyan digere nava xwe û Sûriyeke demokratîk û nenavend were avakirin. Herwiha destwerdanên biyan yên ku Sûrî veguherandine qadeke şer, pêwîst e werin rawestandin. Di heman demê de, diyalokeke netewî ya berfireh ku hemû hêzên siyasî û civakî bê cûdahî beşdar bibin.”

**‘Pêwîst e hikumeta veguhêz a Şamê gavên cidî bavêje’**

Hevseroka Partiya Têkoşîna Demokratîk Xunav Mele axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Peyama me weke Partiya Yekîtiya Demokratîk zelal e, Sûrî tenê bi gel, hemû pêkhateyên xwe û olên xwe were avakirin. Di heman demê de hikumeta veguhêz a Sûriyê ne bi îradeya xwe tevdigere, ji bo ku aramî û aşîtî li seranserî Sûriyê pêk were pêwîst e hikumeta veguhêz a Sûriyê hişmendiya xwe bigiherîne û ji aliyê xwe ve hin gavên cidî bavêje. Herwiha divê ji bo Sûriyeke nû gavên cidî were avêtin. ”



# ‘Pêwîst e her kes xwedî li avakirina civkeke azad û demokratîk derkeve’

Endama Meclisa Partiya Yekîtiya Demokrat PYD'ê Sureya Mustefa diyar ku pêwîst e her kes Manîfestoya Aştî û Civaka Demokratîk bixwîne da ku xwedî li siberoj û avakirina jiyaneke azad, aştî û demokratîk derkeve.

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Ji bo pêvajoya ku Rojhilata Navîn tê re derbas dibe, Rêberê Gelê Kurd Abdulah Ocalan pirtûka Manîfestoya Aştî û Civaka Demokratîk nivîsand û ji tevahî gelan re pêşkêş kir. Da ku riya çareseriya pirsgirêkan hesan bibe. Ji ber vê yekê niha li hemû Bakur û Rojhilatê Sûriyê manefêstoya Rêber Apo ya Aştî û Civaka Demokratîk tê xwendin, ji bo ku di avakirina civakek aştî û demokratîk mesoger bikin.

Derbarê girîngiya xwendina Manefêstoya Civaka Demokratîk a Rêber Apo, endama Meclisa Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD’ê Sureya Mustefa ji Rojnameya me re axivî.

Sureya Mustefa di destpêka axaftina xwe de diyar kir ku ew bi awayekî rojane manefêstoya Civaka Demokratîk dixwînin, li ser her xalekê wê nîqaş dikin û wiha got: “Me di destpêka miha 6`an de perwerdeya xwendina manefêstoya Civaka Demokratîk da destpêkirin. Di destpêkê de rêveberiyên Partiya Yekîtiya Demokratîk nêzî 13 rojan derbasî perwerdeyên girtî bûn, da ku manefêstoya Rêber Apo ya Civaka Demokratîk bi awayekî baş û zelal were fêmkirin û bi encam be. Piştî wê giştî rêveber û endamên Partita Yekîtiya Demokratîk derbasî perwerda xwendina manefêstoyê bûn. Bê guman ev perwerde û xwendina manefêstoyê bi armanca ku em di fikir û ramanê Rêber Apo de xwe kûr bikin û di nava jiyan û caivaka xwe de pêk bînin. Bi taybetî pêvajoya ku niha herêm tê re derbas dibe pêwîstî heye ku em vê pirtûkê bizanibin û li gorî paradîgmaya Rêber Apo gavan bavêjin. Em rojane vê pirtûkê dixwînin û li ser her xalekê nîqaş dikin. Rêber Apo di vê pirtûkê de behsa fesxkirina PKK ku derbasî qonaxa tekoşîna siyasî bû, dîroka Kurd û Kurdistanê, Modernîteya Kapîtalîst, azadiya jin û hwd…şîrove dike.”

**‘Bi aktîvkirina komînan wê civakeke aştî û demokratîk mîsoger bibe’**

Sureya Mustefa di berdewamiya axaftina xwe de wiha anî ziman: “Di Menîfestoya Rêber Apo de, tiştê herî zêde bala me kişand ku wî girîngî daye xebatên komînan û her ji bo pêşxistina wê bi îsrar e. Ji ber vê yekê niha hewldanên me yên herî zêde ku em xebatên komînan bi awayekî aktîvtir bidin pêş û pêwîst e her kes jî girîngî û giraniya wê bizanbe. Bêguman bi aktîvkirina komînan wê civakeke aştî û demokratîk mîsoger bibe.”

Sureya da zanîn ku Heya niha ew xwendina menîfêstoyê berdewame û bidawî nebûye, lê piştî ku bi dawî bibe ew ê di hemû saziyan de bikin piratîkê, di heman demê de ji bo danasîna komînan û meclisan bi awayekî rast û zelal ku hîn zêdetir rola komînan di nava civaka me de were pêşxistin, wê perwerde werin dayin û şîrovekirin.

**‘Pêwîst e her kes xwedî li avakirina jiyaneke azad, aştî û demokratîk derkevin’**

Endama Meclisa Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD’ê Sureya Mustefa di dawiya axaftina xwe de da xuyakirin ku ew ê wekî ku Rêber Apo pêşniyar dike, pêk bînin û wiha pê



de çû: “Menîfesto ji bo hemû gelan hatiye pêşkêşkirin, ji ber vê yekê pêwîst e her kes bixwîne û xwedî li siberoj û avakirina jiyaneke azad, aştî û demokratîk derkevin. Ji ber ku Rêber Apo behsa dîroka Kurdan dike ku çawa Kurd xwedî dîrokeke kevnar in û çawa li hemberî nasnameya Kurdî şerê bi hezaran salan hatiye meşandin, kiriye. Pêwîst e em jî wekî endam û rêveberên Partiya Yekîtiya Demokratîk, girêdayî vê manîfestoyê, xwe di warê demokratîk, îdeolojîk, civakî, avakirin, rêvebirin û rêxistinkirinê de ji nû ve xwe birêxistin bikin û xwe ji nû ve saz bikin. Ev gav jî wê bi pêşengtiya jinan pêk were û em di wê baweriyê de ne ku jin wê bikaribe di avakirina civakek aştî û demokratîk de pêşengtî bike û mîsoger bike.”



## Tirsa şerê Îsraîlê

**Farûk Sakik**

Piştî êrişên Îsraîl yên li dijî Hamasê, şer ji nû de ket rojeva Tirkiyê. Rayedarên Îsraîl daxuyanî li ser hev didan û digotin; heger kî ji Hamasê re malovanî bike, wê hedefa me de bin û aqûbeta Yemen û Qatarê bijîn. Ev daxuyanî û gef herî zêde ji bo Tirkiyê hat nirxandin.

Agahiyên di mitfeqa AKP’ê de dihatin pêjandin, di kanalên televizyonên AKP’ê de dihatin servîs kirin.

Dema behsa şerê Îsraîlê kirin, wan jî peznê mezinbûna Tirkiyê kirin. Dîsa darikek dabûn destê hin akademisyen, rojnamevan û generalên teqawitkirî, wan didan axaftin.

Ew generalên mezin, qet şerm nedikirin ku di şerê dijminatiya Kurdan de, bi serneketine, darbe xarine û ji heremê vekişandine û piştî demek jî ew teqawit kirine.

Derveyê ragihandina AKP’ê, hin kesên maqûl tevdigerin jî bal dikişandin ser vê senaryoya şerê ku nêz dibû. Van kesan bi giranî dixwazin Tirkiyê ji şerê Îsraîlê dûr bixin.

Lê ev şerê ku nêzik dibe Bahçelî salek berê dîtibû. Dema ku li parlementoya Tirkiyê bangî Rêber Apo dikir, di hemna demê de îtiraf kir ku şerê Îsraîl nêzik dibe.

Başe ku ev şerê ku hûn îhtîmal didin destpêbike, hûn ji Kurdan- ji Rêber Apo çi alîkarî dixwazin? We digot ku aştiyek mayinde were vê axê, demokrasi yê pêşbikeve.

We tiştek din dixwest. Şerê bi Kurdan re bi dawî bibe wê 2 eniyên şer dernekevin pêş Tirkiyê. Rêber Apo bang kir Kurdan şer da seknandin.

Lê dema ku di mitfeqa AKP’ê de siyaset dihat pêjandin malzeme-agahî-stratejiyên şaş dihatin tevlîhevkirin. Ji bo vê jî encam nedihatin girtin.

Li gorî van seneryoyên şaş, hin derew jî afirandibûn. Seneryoyên cûda belav dikirin. Digotin Îsraîl wê li Sûrî Kurdistanek avabike û wê ji vê heremê berbi welatê me êrîşan bidin destpêkirin.

Dema ku ev bi kesî nedan îknakirin, nedan bawerkirin, vegeriyan siyasetek cûda xistin rojeva xwe. Dixwaze li herêma rêveberiya xweser aloziyan çêbike. Dixwaze êl û eşîrên Ereb li dijî sîtemê li dijî QSDê sor bike. Dixwaze ku Kurdên vê heremê werin qetil kirin. Hemû stratejiya xwe ya vê serdemê li ser vê yekê înşa kirine.

Başe dema li ser daxwaza we HTŞ êrîşî Kurdan bike, hûnê bi Kurdên li Tirkiyê re çawa biratiya hezar salan a we binav dikir, ji nû de avabikin?

Yeka dina, li vêderê ne bitenê Kurd di hedefê dane. Gelên wek Ereb, Sûryanî û Ermen jî têne tehdît kirin.

Kurd her dem bi Şamê re ji bo muzekere û diyalogê amadne. Hewldanên wan henin. Desteyên ku têne amadekirin, li ber deriyê Şamê têne vegerandin.

Rejima li Şamê jî vê yekê naxwaze. Lê îstixbarat û dîplomasiya Tirk a li Şamê bicîh bûye li ser Colanî hukim dike.

Di demek waha de di navbera hêzên koalisyonê rejima Şamê de jî pirsgirêk çêdibin. Ev hêz naxwazin li Sûrî kaos çêbibe. Derfet û îmkanên mezin dane iktidara Colanê ya demî. Ji bo Sûriyê hin sererastgirin çêbibin wext dane.

Di demek waha de gelo çima Tirkiye di kaosa Sûrî de israr dike. Dixwaze kos çêbibe û ew jî tehdîta sînorê xwe sedem nîşan bide û bikeve Sûriyê. Sala 2015’an de dema bi DAÎŞ’ê kaos li Sûrî hebû, Tirkiye li benda encamp sekinî. Dema ku DAÎŞ hat berterafkirin, Tirkiye dest bi midexleya nav Sûrî kir. Hin herem dagir kir, çeteyên wek HTŞ ji bo rojek îro xwedî kir. Îroj ji HTŞ bedela xwedîderketina xwe dixwaze. HTŞ ji bo vê yekê di tengasiyê deye.

## Sûriyê; hevkarî an jî hevcûdabûn e?



**Zekî Bedran**

Em dikarin bibêjin ku ji dawiya desthilatdariya Baasiyan ve di rewşa gelê Sûriyê de tiştek neguheriye. Desthildariya HTŞ’ê, ku şûna rejîma Baasiyan girt, hewl da ku pergalek ji yek-partî ya Baasiyan jî paşverûtir ava bike. Wan payin kir ku dewletê ji nû ve ava dikin, lê hemû gavên ku wan ji bo vê yekê avêtin yekalî bûn. Wan hemû partî, dezgehên siyasî û komên civakî ji bilî xwe ji derve hiştin. Hikûmeta heyî bi tevahî ji hêla HTŞ’ê ve hate destnîşankirin. Meh li ser guhertina hikûmetê derbas bû. Ev pêvajo bi komkujiyên ku ji hêla HTŞ’ê ve hatine kirin ve hat dagirtin. Li şûna ku piştî komkujiya Elewiyan pêşî lê bigirin, Durzî jî xistin rêza qirkirinê. Hêzên Rojavayî Ehmed Şera wek serok komarê Sûriyê di pejirîn in. Her wiha wan hikûmeta ku ava kirin nas kir. Tevî fikar û gumanên xwe, ew îdîa dikin ku ew ê bi HTŞ’ê re berdewam bikin ji ber ku cîgirê HTŞ’ê tine ye. Li şûna ku rewşa gel bifikirin, wan berjewendiyên xwe dan pêşiyê û bi hevsengiyên siyasî yên ku ew ê ava bikin mijûl bûn. Qaşo HTŞ hewl dide ku yekîtiya Sûriyê biparêze. Yekîneyên herî xurt ji hêla dilxwazan ve û bi razîkirina civakê têne avakirin. Lê, HTŞ vê yekê bi karanîna hêzê, her kesî bi xwe ve girêdide û serdestiya xwe ava dike. Di encamê de, li şûna yekîtiyê, wan fikar, tirs û bêbawerî kûrtir kiriye.

Durzî niha ji berê bêtir ji Şamê dûr in. Elewî jî di nav lêgerînê de ne. Tirs û xofekê mezin li derdora wan belav bûye. Herêmên Rêveberiya Xweser dixwestin beşdarî avakirina Sûriyekê demokratîk bibin. Ew amadebûn ku ezmûnên xwe yên demokratîk parve bikin. Lê, ew jî derve hatine hişt in. Hikûmeta Tirkiyê, li gorî zimanê xwe, hewl dide ku gelê vê herêmê wekî “cudaxwaz” bi nav bike û armanc bigire. Welatên mîna DYA û Fransayê ji bo navbeynkarî û lihevhatina aliyan destwerdan kirin. Ev hewldan jî ji hêla dewleta Tirkiyê ve hate astengkirin. Li şûna ku gelê Sûriyê bike yek û bi hêzên cûrbecûr re lihevhatinek çêbike, HTŞ berdewam kir ku xwe ferz bike û tiştê ku dixwest bike. Hat ragihandin ku Ehmed Şera dê beşdarî cîvîna NY bibe. Ew ê li ser navê dewleta Sûriyê biaxive. Lê kiryarên ku li Sûriyê çêbûne kêm caran tê pirsîn. Şera jî ji bo rewakirina desthiladariya xwe hilbijartin kir rojev. Ew ê xwe wekî ku hilbijartin li dar xistiye nîşan bide û mîna dewletên din, ew ê îdia bike ku rewşa me tê fêmkirin, lê hilbijartin li holê tine ye. Hilbijartinên weha li tu deverek din a cîhanê nayên lidarxistin. Dibe ku bi tiştên vî rengî di destpêka sedsala borî de hebûn, lê îro ne wisa ne. Tê navê wê bike parlemento lê vesaziyê wan çêbik e. Ev nabin parazvanên gel; dibin berdevkê Ehmed Şera. Yên mayî nayên hilbijartin. Ew ji hêla komîsyonên ku ji hêla HTŞ’ê ve hatin vesazkirin û têne destnîşankirin. (Ne diyar e ku ka hilbijartinek bi vî rengî ya gumanbar dê qet pêk were an jî pêk ney ê?)

Li Sûriyê, partî û rêxistinên cûdaxwaz nikarin beşdarî hilbijartinan bibin. Zagonên hilbijartinê an pêşbirk tine ne. Ev tenê hilbijartinek nîne. Berê NY bi rêya zagona 2254 çareseriyek hilbijartin û siyasî ya ku hemî aliyên li Sûriyê tê de beşdar dibin pejirand. Niha, ev biryar nayê pejirandin. Wekî ku tê dîtin, di Sûriye de hên aramî ava nebûy e û yekîtî bi dest nexistiye. HTŞ nebûye xwediyê wê pêkanîn û hişmendiyê. Wê ti nerazîbûn an hewldanek nekiriye ku li dijî hebûna leşkerî ya Tirkiyê li Sûriyê û destwerdana wê ya ji dil di karûbarên navxweyî yên wê de derkeve. HTŞ her wiha Durzî tekbirin e, wan neçar kiriye ku li Îsraîlê penaber bibin. Her wiha hewl dide ku herêmên xweser, ku beşek girîng a Sûriyê pêk tîne, neçar bike ku radest bibe. Ger ev yek bi ser nekeve, ew amadekariya êrîşekê gengaz dike. Ew di vê mijarê de bi tevahî bi Tirkiyê re di ahengekê de dixebite. Rêveberiya Xweser deriyê xwe ji bo danûstandinan û hemû goftûgoyên ji bo çareseriyekê yekîtiya Sûriyê vekirî hiştiye.Rêveberiya Xweser ti çareseriyên erênî red nekiriye û her gav amade ye ku gavên berbiçav bavêje. Lê, heta niha, rêveberiya veguhez ya li Şamê tu gavên berbiçav neavêtiye. Rûxmê vê yekê jî, ew Rêveberiya Xweser tawanbar dike û dibêje ku Rêveberiya Xweser li gorî peymana 10’ê Adarê tevnager e. Peyman xalek ji bo avakirina desteyekê danûstandinê û xalek jî di navbera aliyan de ji bo yekbûnê ava bike cih digir e. Ger herêmên xweser dê avahiyên xwe yên leşkerî, navendî û siyasî radestî HTŞ bike, çi hewcedariya peyman û desteya danûstandinê heye? Wekî din, peyman xalên wekî teqeziya destûrî yên mafên Kurdan jî bingeh digir e. Ew Ehmed Şara bû ku ew îmze kir. Lê destûra demkî ya ku wan paşê ragihand, di vê mijarê de ti bend an jî xal tine bû. Niha, ew propagandayê li cîhanê dikin û îdia dikin ku QSD û Rêveberiya Xweser tevlî peymanê nabin. Ji ber vê yekê, îmzeya wan ji bilî karekî astengkirinê û xapandinê tiştek din nebû! Şera dibêje ku QSD nûnertiya hemû Kurdan nake. Divê ev pirs were pirsîn: Gelo Şera nûnertiya hemû gelê Sûriyê dike? Ger niha hilbijartinek azad bihata kirin, ew ê rêjeya sedî çend ji dengên gel werbigire? Eşkere ye ku asta nûnertiya QSD ji ya Şera pir bilindtir û xûrtir e. Ev ne zimanê çareserî û aramiyê ye. Zimanê alozî û tevlîheviyê dê li Sûriyê ji çareseriyê re xizmet neke. Gelên Sûriyê dixwazin di hawîrdorek aştiyane û demokratîk de bi hev re bijîn. Çareserî ne di şer û êrîşan de ye, lê di lihevkirinê de ye.